Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî | Jimar :1102 | 24-Îlon- 2023 | www.ronahi.net/ku/

Navnîşan
www.ronahi.net/ku/
nameronahi@gmail.com
423165

# Yek Par; destkeftiyeke hunerî ya şoreşê ye

**Şagirtên Akademiya Şehîd Yekta Herekol li hev civiyan û komek çêkir. Dûre jî navendeke çand û hunerê vekirin. Di navendê de zarok fêrî muzîkê dibin.**

di şoreşê de çanda gel geş bikin û ji bo pêkanîna armanca xwe bêhtir balê bikişînin ser zarokan.

Navend bêhtir bi zarokan re mijûl dibe. Kawa Kalê li ser vê yekê got: "Dema tu amûrên muzîkê ji zarokan re lê didî,



Yek ji berhemên Şoreşa 19`ê Tîrmehê jî Koma Yek Par e. Ev kom li ser fikra hin muzîkjen, sînemager û stranbêjan di 2021`an de li Qamişloyê hat avakirin. Endamên komê di sala 2015`an de ji Akademiya Şehîd Yekta Herekol a Çand û Hunerê der çûne.

Koma Yek Par ne tenê konseran li dar dixe, di heman demê de bi dehan zarokan fêrî amûrên muzîkê kirine ku berhemeke wan jî Orkestra Zarokan a Rojava ye. Kom ji 8 mamosteyên muzîkê pêk tê.

Di 11'ê Tîrmehê de Koma Yek Par ji bo berfirehkirina xebatên xwe navendeke çand û hunerê bi navê xwe li taxa Xerbî ya Qamişloyê vekir.

Muzîkjen û stranbêjên komê li navendê dersên muzîkê didin. Navend kesên 6 salî heta 60 salî pêşwazî dike.

Ji damezirînerên Koma Yek Par û mamosteyê muzîkê Kawa Kalê yê ji navçeya Serêkaniyê, xewna wî ya ku bibe mamosteyê muzîkê, di şoreşê de pêk hat. Kawa Kalê got ku wan xwest dil dikin bikevin nava wan amûran. Hem psîkolojiya zarokan rehet dibe, hem jî kûrbûnekê dide lêhûrbûna wan, lewma jî dikare jêhatîtir be."

Tembûrvan û mamosteyê tembûrê yê Navenda Yek Parê Diyar Osman jî ji bajarê Hesekê ye û hê 24 salî ye. Ji 14 saliya xwe ve li tembûrê dide. Dibêje yek ji projeyên ku wan daniye pêşiya xwe amadekirina materyalên dibistanên seretayî ye.

Diyar Osman got: "Dil û tembûr hev digirin, bingeheke ji bo dengê stranbêjan. Dengê ku tê strandin heke bê tembûr be, ji bo min wekî guhdar nexweş tê."

Navend amadekariya pêkanîna projeyên şevbuhêrkên hunerî û lidarxistina konseran dike. Li kêleka vê yekê jî ji bo 120 zarokên bi nexweşiya pençeşêrê ketine, fîlm û şanoyan pêşkêş dikin, her wiha stranan li wan didin guhdarkirin.

Her wiha Yek Par amadekariyên vekirina perwerdeya şêwekarî û govendê jî dike.

# 2 stranên nû ji bo bîranîna Jîna Emînî

**Hunermend Firmêsk Hafiz bi navê 'Firmêsk' û hunermend Ridvan Îbrî jî bi navê 'Jîna Emînî' stran amade kirin û wek klîb belav kirin.**

Jîna Emînî di 16'ê Îlona 2022'yan de li Tehranê ji aliyê hêzên rejîma Îranê ve hatibû qetilkirin. Serhildana piştî qetilkirina wê dest pê kir, salek e dewam dike û dengvedana xwepêşandanên bi silogana "Jin Jiyan Azadî" gihişte tevahî cîhanê û bi pêşengiya jinê li her deverî gel rabû ser piyan.

Hunermendê kurd Ridvan Îbrî li ser bîranîna Jîna Emînî stran û klîba bi navê "Jîna Emînî" amade kir. Kom Muzîkê klîbê li ser hemû hesabên xwe yên platformên medyaya dîjîtal belav kir.

Firmêsk

Hunermend Firmêsk Hafiz jî di salvegera qetilkirina Jîna Emînî de li ser kanala xwe ya Youtubeyê, bi navê 'Firmêsk' (rondik) stranek belav kir.

Hunermend Firmêsk Hafiz li ser Facebookê peyamek belav kiribû û tê de wiha gotibû: "Gelek keyfxweş im ku min li gel kesên dilsoz berhemeke hunerî li ser Jîna Emînî çêkiriye"





# Bi Fransî Sosyolojiya Azadiyê

Sosyolojiya Azadiyê cilda sêyemîn a "Manîfestoya Civaka Demokratîk" a Rêber Abdullah Ocalan e, ji aliyê weşanxaneya "Editions du Croquant" bi zimanê Fransî derket.

Berê du cildên ewilî yên rêzenivîsa "Manîfestoya Civaka Demokratîk" bi navê "Serdema Xwedayên Bi maske û Qralên Bi Perde" û "Serdema Xwedayên Bê maske û Qralên Tazî" bi zimanê Fransî hatibûn çapkirin.

Nûnerê komîteya wergerê di daxuyaniya xwe de diyar kir ku wan bi serbilindî berhemên Rêber Abdullah Ocalan wergerandine Fransî. Her wiha wan da zanîn ku du cildên mayî yên rêza "Manîfestoya Civaka Demokratîk" di demeke nêz de wê bi zimanê Fransî bên çapkirin. Berhema ku niha tenê li ser malperên Konseya Kurd a Demokratîk a Fransayê




(CDK-F) û weşanxaneya Editions du Croquant tê firotin, wê ji 9'ê Cotmehê û pê ve li ser platformên navneteweyî yên wekî Amazon, FNAC, Gibert û pirtûkfiroşên Fransî bên firotin. Rêber Abdullah Ocalan hêza avaker û hilweşandinê ya aqil, têkiliya di navbera aqil û exlaq, aqil û bawerî, exlaq û dînamîkên civaka exlaqî de radixe ber çavan. Di pirtûkê de ew li aliyekî di warê dîrokî û civakî de destketî û şikestinên hêzên dijsîstemê dinirxîne û li aliyê din bi pirsgirêkên bingehîn ên sedsala 21'ê jî bi arasteyên fikrî, exlaqî, siyasî û têkoşînê dadikeve.

Sudoku: Bersiv 13

| | | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| 1 | 7 | 6 | 4 | 8 | 9 | 3 | 2 | 5 |
| 5 | 8 | 9 | 7 | 2 | 3 | 1 | 4 | 6 |
| 4 | 2 | 3 | 6 | 5 | 1 | 8 | 9 | 7 |
| 3 | 9 | 2 | 8 | 4 | 7 | 5 | 6 | 1 |
| 8 | 1 | 4 | 5 | 3 | 6 | 2 | 7 | 9 |
| 6 | 5 | 7 | 9 | 1 | 2 | 4 | 8 | 3 |
| 9 | 4 | 5 | 3 | 6 | 8 | 7 | 1 | 2 |
| 9 | 3 | 1 | 2 | 9 | 4 | 6 | 5 | 8 |
| 2 | 6 | 8 | 1 | 7 | 5 | 9 | 3 | 4 |

Sudoku:Pirs 14

| | | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| | | | 7 | 8 | | 5 | 6 | 2 |
| 2 | | | | | 4 | 9 | | |
| | 1 | | 2 | | | | | |
| | 3 | | | | | 1 | 2 | 9 |
| | 6 | | | | | | 8 | |
| 8 | 2 | 1 | | | | | 5 | |
| | | | | | 3 | | 1 | |
| | | 3 | 5 | | | | | 8 |
| 5 | 4 | 9 | | 1 | 8 | | | |

## FERHENGA BIWÊJAN

**Hê nexwarî bi simbêlên wî ve mehî:**
-Dema yek berî ku tiştekî dibîne, yan dixwe, yan bi dest dikeve pesnê wê tiştê dide hingê jê re tê gotin.

**Ji cotkar re li hev hatibû rûdinişt pesnê xwe dida:**
- Şansê wî heye; ne ji jêhatîbûna wî ye.

**Ji rûvî re gotin tu çima xwe dihejînî, got li min tê û ji min tê:**
Tişta ez dikim li gorî min e; rexneya we ne di cî de ye.

**Ji xwe re biçîne nîskê:**
- Ji xwe re pesnê xwe bide, ji me re behs neke.
*Ji ber ku A. pir behsa xwe dikir û baweriya B. pê nedihat, got; ji xwe re biçîne nîskê.

**Keçelo mû bi serê te ve nînin, got; keziyên xaltiya min li qûnê dikevin:**
- Dema tiştekî yekî tinebe ku pê pesnê xwe bide, lê pesnê mirovên xwe dide hingê tê gotin.

**Kew jê re firandin:**
- Pesnê wî da.

**Keziyên min nînin lê yên xaltiya min li pehniyên wê dikevin:**
- Dema tiştekî yekî tinebe ku pê pesnê xwe bide, lê pesnê mirovên xwe dide hingê tê gotin.

**Li bejna heyranê her kiras tê:**
- Bedew e; xweşik e.

**Ma kurê kê ye:**
- Daye bi bavê xwe ve, (yan) daye bi diya xwe ve.
)Dema hin pesnê zaroyên yekî didin hingê dibêje. Dema bi xirabî behsa zaroyên yekî tê kirin hingê jî tê gotin(

**Mala bavê Şemlanê:**
- Dema yek pesnê xwe dide û yên din jê bawer nekin wê demê tê gotin.

**Mala bêpisîk mişk tê de pêlewan in:**
- Ji bo kesên tirsonek lê pesnê xwe didin tê gotin.

**Mal têr e kevanî şêr e:**
- Di heyînê de her kes pesnê xwe dide; ya girîng ew e ku di tineyiyê de mirov jêhatî be.

**Min çavê te xwaro:**
- Tu baş î; tu tiştên baş dikî.

**Min çend eyd pêşiya te xwarine:**
- Di temenê xwe de ez ji te mezintir im; ez ji te pirtir zanim.

**Min tenûrek nan berî te xwariye:**
- Bi heman wateyê.

**Min jî ew qûn dîtiye:**
- Pesnê xwe nede, ez te pir baş nas dikim.

**Nav lê da:**
- Pesnê wî da; behsa mêraniya wî kir; da binê çengên wî; gaerm kir.

Ji Pirtûka Ferhenga Biwêjan Ya Diyar Bohtî



# Li Rojhilatê Kurdistanê felsefeya jin jiyan azadî...(1)

Rojhilatê Kurdistan êdî bi leşkeşiyên vê dawiyê re weke qirargeheke leşkerî lêhatiye. Çend roje ku balfirên şer li ser esmanê bajarên weke Seqiz û Sine rabûne û etmosfrekî şer yê mîna serdema şerê Îran-Îraqê(1980-1988) tê ber çavan. R-2

Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî | Jimar : 1102 | 24-Îlon- 2023 | www.ronahi.net/ku/

# 'Jin pêşenga jiyana azad e'



Endama Kordînasyona Kongra Star Remziya Mihemed diyar kir ku xwepêşandanên li tevahî sûriyê û bi taybet li herêma Siwêdayê hatine li darxistin û berdewamin, armanca wan guhertina sîstema navendî û hişmendiya dewlet ntewa heyî ye. R-5

# AZADIYA RÊBER APO MISOGERIYA AŞTIYÊ LI ROJHILATA NAVÎN E

Însiyatîfa Gel a Herêma Cizîrê di 9'ê Îlonê de bernameya xwe ya çalakiyên banga azadiya fîzîkî ya Rêber Apo aşkere kir. Bi diruşma 'Azadiya Rêber Apo misogeriya aştiyê li Rojhilata Navîn e' çalakî û meş li tevahî bajarên herêmê dewam dikin. R-3



# 'Bi berxwedaniyê wê xiyanet û dagirkerî têk biçe'



Dewleta Tirk a dagirker û bi hevkariya PDK'ê, êrîşên xwe yên li dijî hebûna gelê Kurd dewam dike, Sekreterê Partiya Demokrat a Kurdistanê-Sûriye (PDK-S) Ciwan Siko diyar kir ku wê bi vîn û berxwedaniya gelê kurd xiyanet û planên dagirkeriyê têk biçin. R-4



## Jîna Emînî, Dewleta Îranê Dihejîne!

Ahemd Aktaş R-4

# Bila gerdûn bê stran nemîne

Pirtûka Bermal Çem a bi navê "Çemê Stranan" derket. Çem bi gotina, "Bila gerdûn bê stran nemîne û her berbangê bi lêgerîna heqîqeta notaya azadiyê we hembêz bike" dest bi pirtûkê dike. R-7



# Akademiya Perwerde û lêkolînên Stiratîjîk

Desteya Perwerde û Fêrkirinê ya Bakur û Rojhilatê Sûriyê, bi armanca pêşxistina asta rêveberan, yekemîn Akademiya Perwerde û lêkolînên Stratîjîk li bajarê Qamişlo vekir. R-6



# Li Rojhilatê Kurdistanê felsefeya jin jiyan azadî...(1)

**Kakşar Oremar**

Rojhilatê Kurdistan êdî bi leşkeşiyên vê dawiyê re weke qirargeheke leşkerî lêhatiye. Çend roje ku balfirên şer li ser esmanê bajarên weke Seqiz û Sine rabûne û etmosfrekî şer yê mîna serdema şerê Îran-Îraqê(1980-1988) tê ber çavan.




Her çiqasî ku em nêzîkî saeta sifir a salvegera kuştina Jîna Emînî dibin, tedbîrên ewlehiyê û hebûna hêzên Pasdaran û Besîcê tevê hêzên taybetî yên parastin û Êtlaatê li Seqiz, Mehabad, Sine, Urmiye û bajarên din yên Kurdistanê tundtir dibin. Şahidên ku rewşê dişopînin radigihînin ku xalêyên kontrolê li her dera axa rojhilatê Kurdistanê zêdetir û danîna kamerayan li geleke deran zêdetir kirine. Li hemû cih û deverên ku wan bi pêwîst dîtine cihan jhêzên taybetî hatine şandin. Ji berî pênc rojan li ber deriyê aramistana Ayçî ya ku Jîna lê hatiye veşartin maşîneyeke zirxî tevî dehan kesên bi kincên sivîl hatiye bicihkirin. Çavkaniyek ji Parêzgariya Kurdistanê(Sine) dibêje: Hikûmet plan dike ku deriyên bajarê Seqezê bo bajarên cîran bigirin û rê li ber hatin-çûyîna xelkê bigirin. Sala derbasbûyî di 40mîn roja şehdeta Jîna de hikûmetê hemû hewlên xwe dan ku rê li ber ketina aramistana Ayiçî bigire, lê wan nekarîn li ber lehiya hatin-çûyîna gel rawestin û bi tirseke mezin ji wira derketin.

### Jîna Emînî kîye?

Jîna Emînî bi nasnav xwe yê din Mehsa Emînî di sala 2000 de li bajarê Seqez yê Rojhilatê Kurdistanê ji dayîk bûye. Malbata wan Kurdperwer û di nava xelkê de naskirîne. Xwendina xwe heya dîplomê li Seqizê xwend û piştre di azmonên ji bo çûyîna zanîngehê hate pejirandin û yê li bajarê Urmiyê dest bi xwendina xwe ya bilind bikira. Ji bo cî bi cîkirina karên borukrasiyê çû Tehranê, lê li wira hate kuştin.

Di gera xwe ya bo Tehranê de li gel malbata xwe, ew ji ber nebûna hîcabekê weke a jinên Şîî ji aliyê hêzên ewlehiyê ve hat girtin û birin îdara qaşo şîretkariyê, lê mixabin li wira ew rastî işkenceyên giran hat û derbeyeke giran li serê wê dan. Weke dayîka Jîna daye diyarkirin weke her ciwanekê Jîna jî bi çarşefê serê xwe girêdabû, lê niyeta wan berpirsên dewletê destdirêjî bû.

Jîna Emînî ji ber êşkenceyên zêde ku derbeyên giran li serê wê dabûn, birîndar bû û roja 16.09.2022ê piştî sê rojan li nexweşxaneya Kasrî ya Tehranê jiyana xwe ji dest da. Kuştina Jîna bû sedema gelek nerazîbûnên navxweyî û derve, roja 19-09-2022 li rojhilatê Kurdistanê greva giştî hat ragihandin û hêdî-hêdî gel li Rojhilatê Kurdistan û hemû Îranê rabîn ser piyan.

Hêzên leşkerî yên Îranê gule li xwepêşanderan reşandin û di encamê de berê li Seqiz û Mehabadê û piştre jî li Urmiyê çend kes hatin kuştin û birîndarkirin. Dema Jîna Emînî hate şehîdkirin jiyê wê 22 salî bû.

Pêre jî girevên birçîbûnê di girtîgehên îran û Kurdistanê de, xwepêşandanên xwendevanên zanîngehên Tehran, Isfehan û gelek bajarên din bû sedema destpêkirina pêvajoyeke nû a dijberiyê bi rejîma dîktara Îranê re.

### Pêvajoyeke nû li pey 44 salan

Ji 16'ê Îlona sala 2022an û şûnde tevgereke berfireh li dijî hikûmeta Îranê destpêkir û bandora wê li ser gel û opozisyonê, çavdêrên siyasî li hemû Îran û cîhanê matmayî hiştin. Yanî di asta gel de, tevgerek ku piştre bi sernavên wekî “jin, jiyan, azadî” hate nasîn, zêdetir ji tevgerên berê ên li dijî desthilata Tehranê xwedî bandor û rûberê wê yê cografî jî pir berfirehtir bû. Hereketa an jî “Tevgera Jîna” ji aliyê erdnîgarî, cihêrengiya çînên xwenîşander, berdewamî û jimara kombûnan, girevên dijberî dewletê û her wiha ji aliyê tundiya zextên li ser hikûmetê, rekora her tevgereke din a protestoyî di dîroka dewleta îslamî a Îranê de şikand. Rêberê Îranê ew tevger weke tevlîker û li ser şopa hêzên dij îslam û terorîstên cudayîxwaz bi nav kir, lê gel jî bi dirûşmên weke:” Mirin ji dîktator Xaminêyê re, Kurdistan, Kurdistan çav û dilê hemû Îran...” bersiva wî dan.

Awayê bi dawîhatina jiyana Jîna pir tirajî û mezlumane bû, lê di dilê wê tarîkstanê de her dilopeke xwîna wê bû ronahiyek li dilê me de. Rewş bi giştî hate gûherandin û di warê civakî de gel şiyartir û bi cesaretir ji salên berê daketin qadên dijberiyê. Di warê aborî de jî dewlet li pey wê şoreşê rastî zirar û ziyanên pir mezin hatin.

Destkeftên wê şoreşê mezin û ji tevan mezintir hêzên siyasî yên Kurdistanî bêtir nêzî hev kirin. Herî dawiyê ji bo yekemîn salroja şehadeta Jîna Emînî hemû partiyên sereke yên rojhilatê Kurdistanê banga destpêkirina gireva giştî li hemû Kurdistanê kirine. Ev yeka han bû sedem ku dewleta Îranê jî dest bi gefên zêdetir û leşkerkêşiyên xwe bo ser sinorên başûr-rojhilat bike. Rejîmên dîktator li her derê weke hevin û dema ti rêyekê li hemberî daxwazên demokratîk yên gel nabînin ji bo mijûlkirina raya giştî behsa hinek dijminên ferzî-xeyalî dikin û wan weke sebebên sereke yên rewşa tevlîhev a nava sinorên welatê xwe dibînin. Ji Almana Qeyserî ya sala 1914 bigire heya rejîma Baasî ya Îraqê û rejîma totalîtera ya Tirkiyê bi metodên wiha re xwestine û dixwazin rojekê zêdetir li ser piyan bimînin.

Berevajî wan tiştên ku di sala derbasbûyî de li ser yekrêziya bêmînak di navbera Îraniyan de hatiye gotin, ez di wê baweriyê de me ku dîsa jî Kurd weke berê bi tenê ne û divê Kurd bi berxwedana xwe, bawerîya bi hêza xwe a zatî û dahêneriyê re riyên nû ji bo bidestxistina mafên xwe peyda bikin. Sedem jî ew e ku civaka Kurd bêtir ji civakên din yê nava sinorên siyasî ên Îranê xwedî perwerdeke bilind a siyasî ye. Şoreşa Kurdistanê bi hêza gel ve girêdayî ye û yekane sedema mayîna hêzên siyasî û berdewamiya rêbaza Kurdiniyê jî ev rastî ye. Kurdan di dehan salên derbasbûyî de û herî zêde jî piştî destpêkirina şoreşa Jîn-Jiyan-Azadî de di çalakiyên xwe de yekîtî û biratiya xwe îspat bikin.




### Encama gefên Îranê!

Tevî hemû gef û hêrîş û ultîmatomên pratîkî yên ji hêla dewleta Îranê ve, partiyên Kurdistanî bo yekem car bangewaziyeke hevgirtî-hevrêzî bo lêdanên li dijî wan kirine. Ev yeka ku bi şêweyê xwe cihê pesindayînê ye. Herwiha divê ji gelên din ên Îranê re jî ev rastî bê gotin û dubare kirin ku: Ger bi baweriya we dem dema hevgirtin û yekrêziyê ye, niha dem ew deme, lê ka hûn li kûderê ne? Her kesî li hemû cîhanê dengê şoreşa, Jin_Jiyan_Azadî bihîst lê hêşta jî hinek hêzên qaşî opozîsyon naxwazin bawer bikin ku ev şoreş ji bakur û Rojavayê Kurdistanê gehaye rojhilatê Kurdistan û bingeha wê ji felsefeya rêberekî Kurdan yên xwedî felsefeyeke mirovheziyê yê bi navê Abdulah Ocalan e.



Îran di hewldana çareserkirina krîzên navxweyî de ye lê li dijî Kurdan bi şer û pevçûnên leşkerî yên dervey sinor dixwaze rêbaza şoreşa Jin-Jiyan-Azadî ber bi aqarekî din ve bibin. Ev yeka tim awayê nêzîkatiya konvansiyonel a rejîmên otorîter e ku em niha di sîstema desthilatdar a Erdogan de jî dibînin. Di vir de yê ku her mirovekî Kurd divê bi baldarî xwedîtiyê ji destkeftên mezin yên şoreşa xwe bike. Dijberî bi hereketa siyasî ya Kurdistanê tevî kiryarên terorîstî stratejîya komara Îslamî a Îranê bûye û ew kiriye parçeyek yekbûyî ya nûavakirina xwe di qada siyaseta rojane de. Ger îro em şûna piyên Spahê Pasdaran li Dêrezor, Kerkûk û Hewlêrê dibînin, îspata vê rastiyê ye ku ew ji gûherandinên bingehîn yên li pey destpêkirina şoreşa Jin-Jiyan-Azadî gelekî ditirsin û pêre jî Kurdan weke birêveberên wê şoreşa mezin dibînin. Komara îslamî ji dagîrkirina balyozxaneya Amerîkayê li sala 1979an û belavkirina şoreşê bo Îraq û herêmên din yên li Rojhilata Navîn stratejîya xwe ya domdirêj daye diyarkirin. Li her derê hêzeke îslamî a radîkal û dij metodên demokrasiyê hebe, destê Îranê têde ye. Di roja îro de jî pirojeya navokî(Atomî) û rûbirûbûna bi welatên Rojava, Israîl, Amerîka û destwerdanên li welatên: Sûriyê, Îraq, Erebistana Siûdî, Libnan û Yemenê, berdewam kirîzên herêmî û navdewletî dirust dike da ku hebûna bidomîne. Îran bi behaneya “parastina serweriya yekperçeyî ya axê” xwe weke parêzvanê ewlekariya welat dide xûyakirin û di çavê gelên nava sînorên desthilata xwe de jî hikûmeta herî kêm meşrû û serkûtker a li dijî mafên mirovan û rojnamevan û azadiyên jinê hatiye naskirin. Bi dijberiyên xwe yên berdewam re dixwaze motîvasyon û enerjiya xwenîşandanan di hundir de kêm bike. Yanî şerekî rewanî jî li dijî şoreşgerên Kurdistanê dide meşandin. Herwiha bi çêkirina behaneyeke eşkere û li li gor baweriya xwe rewa ji bo tundkirina tepeserkirina tevgerên protestoyî li Kurdistan û Îranê. Lê hêzên siyasî li Kurdistanê ev planên wan jî vala derxistine.



# Bila gerdûn bê stran nemîne

## Pirtûka Bermal Çem a bi navê “Çemê Stranan” derket. Çem bi gotina, “Bila gerdûn bê stran nemîne û her berbangê bi lêgerîna heqîqeta notaya azadiyê we hembêz bike” dest bi pirtûkê dike.

Pirtûka Bermal Çem a bi navê “Çemê Stranan” ku ji gotin, nota û çîrokên stranan pêk tê ji Weşanên Aryenê derket. Edîtoriya pirtûkê Roj Agir, redaksiyona wê Şeyma Orhan û Ferhat Patiyev, mîzanpaja wê Jûjî Tasarim, dîzayna bergê Sadik Hangul kiriye û wêneyê bergê pirtûkê Nûredîn Anyig xêz kiriye. Di pirtûkê de 80 stranên ku gotin û muzîkên wan zêdetir yên hunermend Bermal Çem in hene. Ji van stranan 8 stranên bi navê “Demsal, Bexçê Zarokan, Morî Me, Lîstokên Me, Pepûle Me, Xwezaya Rengînê, Efrîna Min Bi Zeytûne û Dayika Min Rindik” e ku ji bo zarokan hatine nivîsîn di pirtûkê de cih digirin.

### ‘Stranên min kombûna jiyana min in’

Di pirtûka ku Bermal Çem bi gotinên “Em ew rêwiyên li dû notaya azadiyê ne, orkestraya me xweza ye, rîtma stranên me dilê çiyayan e. Bila gerdûn bê stran nemîne û her berbangê bi lêgerîna heqîqeta notaya azadiyê wê hembêz bike” dest pê dike, bi gotinên “Her stranek xwediyê çîrokekê ye. Her çîrokek parçeyek ji jiyana me ye; parçeyek ji heqîqeta ji çavan veşartî. Min xwest ez bibim dengê wê jiyan û heqîqetê da ku bigihînim cîhanê dengê kenê wan kesên dilxweşik, pakrewan, ên xatir ji me xwestin…Lewma stranên min kombûna jiyana min in. Bi hêvî û hesreta welatekî azad…” spasiya xwe pêşkeşî hemû kesên di xebata nivîsandina pirtûkê de cih girtine û ked dane dike.

Weşanên Aryenê bi dîmenekê, bi gotinên“Her straneke di pirtûkê de jiyaneke, her jiyanek beşeke têkoşîna azadiyê vedibêje. Her notaya vê berhemê aydê çiya û zarokên dil azad ên çiya ne. Ev pirtûka ku weke arşîvekê ye jî çîroka wan stranên ku me ji Bermal Çem guhdarkirine vedibêje. Çemê Stranan ji dilê Bermal Çem derket û ber bi dilê wêjehez û muzîkhezan ve dest bi herikînê kir” danasîna pirtûkê kir.



### Kêliyeke bêhempa

Li pişta pirtûkê jî ev nivîsa rojnamevan Gulistan Çiya Îke cih digire:“Beriya salan li Çiyayên Kurdistanê em komeke heval û hogir li hev civiyabûn. Li dorhêla me zinarên asê, li nav sînga zinaran cemek diherikî bi gurmegurma mizginiya biharê re. Em bi civat bûn li gel hevalan, bi derd û kulên welat de ketibûn. Lewma dem di bin barê êş, azar û hêviyê de giran giran diherikî. Lê şahiya me jî kêm nedibû. Geh me govend digerand, geh awazeke hêviyê seri radikir li çiyayan, geh em dibûn helbestek li ber têhna agir, li binê taveheyvê. Li berêvareke vî zemanî, dema roj diçû ava, hew min dengek bihîst ji wî milê newalê. Ji binê dareke berûyê dengê sazekê dihat, pê re ji dengekî dilgir û aza tevlî xumxuma çem dibû. Min qesta stranê kir, berê xwe da dara berû û meşiyam. Jineke ciwan di hembêza wê de saz, distirand. Çi bêhempa bû ew kêlî, çend xweş bû. Ma kî dizane, belkû lewma stran hene; ji bo demên bêşîrove bên vegotin.

### Strana Bermalê weke çiyayên welat e

Ew deng û awaz ya Bermalê bû, xwe dabû ber dara berû û distirand. Min guh da wî dengî û pê re jî dil. Ji wê rojê ve bênavber Bermal strana dilê xwe, strana dilê me û strana çiyayiyan distirê. Strana Bermalê bilind e, zîz û asê ye, her weke çiyayên welat e. Kûr e dengê wê, ji binê bîra zeman diqêre gotinên dapîr û bapîran. Gotina wê ristika li gerdena çiyayiyan e, bazinê li zenda zinariyan e. Rîtma wê zengila dilê şervanan e, ji Zagrosan heta Botan û Dêrsimê, miriyan ji xewê şiyar dike, pakrewanan oxir dike. Çiyayiya me, stranên dilê me distirîne. Ji yên çûyî, ji yên li vir û yên bên berhev dike êş, hêvî û azadiyê...”

# Hunermenda dîmenên kêfê

**Sala 1893´yan Muzexaneya Louvre di bin mohra qelp a Frans Hals de monograma Judith Leyster nas kir û heman salê li ser berhemên Judith Leysters berhemeke zanistî jî derçû.**



Judith Leyster şêwekareke Holandî ya sedsala 17´an e. Wê berê xwe gelekî daye wê yekê ku wêneyên kêfa xelkê xêz bike û birengîne. Heta wê di portreyekî xwe bi xwe yê sala 1630´î de xwe wisa xêz kiriye, weke ku ew wê kêliyê resmê kemanjenekî bi kêf xêz dike.

Judith Leyster sala 1609´an li Haarlema Holandayê hatiye dinê. Û ew yek ji kêm şêwekarên wê “serdema zêrîn” in ku wêneyên wê heta roja me ya îro hatine. Berhemên wê yên şêwekariyê weke yên Barock tên sinifandin û jixwe her kesê ehlê meseleyê vê yekê di cih de dibîne.

Navê wê yê bêî kêmasî Judith Jans Leyster e. Ew zaroka heştan a Trijn Jasperdr und Jan Willensz Leyster bû. Em dizanin ku ew sala 1609 li Haarlemê hatiye dinê ji ber ku qeydiya tehfilandina wê ya li dêrê heye û ew 28´ê Tîrmeha 1609´an hatiye tehfilandin. Ew ne ji maleke piçûk bû. Bavê wê ne arîstokrat bû, lê ji bilî hunerê wî yê cawkerî û çêkirina destmalan, ew xwediyê bîraçêkeriya “De Leystare” bû. Lê navê wê sala 1924´an li petaxê ket û îflasa xwe ragihand. Axir dîsa jî ji malbatê hat ku keça xwe perwerde bike. Dersên pêşî nîgarkêş Pieter Fransz de Grebber danê. Ew bi wêneyên xwe yên li ser çîrokên dîrokî û portreyan navdar bû.

Piştî sala 1628´an Judith Leyster çû nêzî bajarê Utrechtê, û li wir bi îhtîmaleke mezin peywendiya wê ya pêşî bi şêwekar Hendrick Terbrugghen û Gerrit van Honthorst re çêbûn. Îlona sala 1629´an bi malbata xwe re ew jî bar dike diçe Zaandam a nêzî Amsterdamê. Nayê zanîn ew çiqasî li cem dê û bavê xwe maye, lê em dizanin ku ew di Mijdara 1631´ê de di dema tehfilandina li dêrê de bûye xwişka axretê ya keça Frans Hals, Mariayê.

Zewaca wê ya bi şêwekar Jan Miense Molenaer a sala 1636´an, berevajî mirov li bendê be, kir ku êdî Judith Leyster kêm wêneyan xêz bike. Lê îro gelek ehlên meseleyê qebûl dikin ku modelên wê û hevjînê wê yek bûn û ew li ser gelek berheman bi hev re xebitîne. Yan jî ew li ser berhemên hev jî xebitîne. Ev yek jî sinifandina berhemên wan gelekî zehmet dike. Judith Leyster sala 1660´î li bajarê Heemstede yê Holandayê wefat dike.

### Heqê xwe ji şagirt stand

Judith Leysterê piştî sala 1629´an dest pê kiriye û berhemên xwe hem mohr kirine û hem jî dema temambûna wan li ser wan nivîsandiye. Em pê dizanin ku atolyeyeke wê hebû û sala 1633´yan yek ji du endamên jin ên Odeya Nîgarkêşan a Saint Lukas bû. Li ser gelek berhemên Judith Leysterê tesîra Frans Hals eşkere ye. Demeke dirêj hostekaran bawer dikir ew şagirta Frans Hals bûye. Lê lêkolînên paşê derxistin holê ku peywendiya wêneyên wê bi yên Dirck Hals re bêhtir bûye.

Wê bi xwe jî paşê şagirt li ber destê xwe gihandin. Sala 1635´an sê şagirtên wê hebûn û yek ji wan Willem Wouters bû. Piştî ku hostekara wî zewicî, Willem Wouters bêyî destûra wê çû ber destê Frans Hals. Judith Leyster hingê doz li dayika şagirtê xwe vekir û jê nîvê heqdestê ji bo şagirtiyê stand. Hema hema temamê nîvê mayî jî Frans Hals danê.

### Dikare qayîşê bi mêran re bikêşe

Di nava berhemên Judith Leysters de portre, xwezaya ne zindî, xêzên botanîk û herî kêm daxkirinek jî hene. Lê yên herê darîçav, wêne û xêzên cûreyan in. Di van wêneyan de ew ruh bi wan kêliyên rojane yên li ber şewqa rohniya findan tîne. Di van wêneyan de bi piranî yan yek yan jî du kes hene. Em wekî din dibînin ku ew gelek caran tercîh dike ku zarok jê re bibin model. Di nava motîfên wê de xort hene yên ku li flût, tembûra kevin a Ewrûpî yan jî kemanê dixin; em dayikan dibînin ku karê dirûnê dikin yan jî porê zarokên xwe şe dikin; em mêran dibînin ku li dûv jinan digerin, em her wiha mirovên ku li xanan şahiyan dikin jî dibînin. Theodorus Schrevelius di kitêba xwe ya li ser Haarlem Harlemias (sala 1647´an derçûye) dibêje, “Gelek jin jî hene ku di karê nîgarkêşiyê de hoste ne û heta roja îro jî navdar in û dikarin bidin ber mêran jî; ji wan herî zêde navê Judith Leyster tê hildan; ew tam jî serê rimê ye di huner de, ji wê re kevaniya mala Molena tê gotin, û ew bi xwe jî şêwekarekî navdar e; Judith Leyser li Haarlemê hatiye dinê û li Amsterdamê navdar e.”

### 250 salan wenda bû

Lê ecêb ew e, tevî ku xelkê hingê hez ji berhemên Judith Leyster kir û bi qedrê wan zanî jî, piştî mirina wê, ew hat jibîrkirin û berhemên wê hê nûka sala 1893´yan ji nû ve hatin kifşkirin. Wêneyên wê beriya wê weke wenda dihatin hesibandin û hin jê jî bi şaşî weke yên Frans Hals hatibûn qeydkirin. Sala 1893´yan Muzexaneya Louvre di bin mohra qelp a Frans Hals de monograma Judith Leyster nas kir û heman salê li ser berhemên Judith Leysters berhemeke zanistî jî derçû. Sala 2016´an jî wêneyekî wê bixwe yê ku wê xêzkiriye yê piştî zewaca wê li Ingilîstanê hat dîtin. Axir îro berhemên wê li Muzexaneyên Den Haag, Leiden, Amsterdam, li Musée du Louvre a Parîsê, National Gallery ya Londonê, National Gallery of Art a Washingtonê û gelek galerî û muzexaneyên din hene.

# Akademiya Perwerde û lêkolînên Stiratîjîk

Desteya Perwerde û Fêrkirinê ya Bakur û Rojhilatê Sûriyê, bi armanca pêşxistina asta rêveberan, yekemîn Akademiya Perwerde û lêkolînên Stratîjîk li bajarê Qamişlo vekir.

**Ciwana Mûsa\Qamişlo**

Di sîstema Pergela Neteweya Demokratîk de girîngiya perwerdeyê li akademiyan cihekî girîng di avakirina civaka Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê de girt, mirov hînî rihê berpirsyarî, parastin, xwebirêvebirin û wekheviyê kirin. Li ser vê bingehê û ji bo pêşxistina asta rêveberan, Desteya Perwerde û Fêrkirinê li bakur û rojhilatê Sûriyê Akademiya Perwerde û Lêkolînên Stratîjîk li bajar Qamişlo da vekiirin û yekem dewreya perwerde di akademiyê de dest pê kir.

Derbarê mijarê de berdevka Akademiya Perwerde û Lêkolînên Stratîjîk Henan Iniz ji rojnameya me re axivî. Henan Iniz da zanîn ku armanca vekirina akademiyê, pêşxistina rêveberan e û wiha got: “Ji destpêka avabûna sîstema perwerdeyê li bakur û rojhilatê Sûriyê, me zêdetir akademiyên perwerdeyê ji bo mamosteyan da vekirin, lê dema niha pêwîstî bi pêşxistina rêveberan jî heye, ji bo perwerdekirin û pêşxistina rêveberan di milê rêbaz, danûstandin û rêvebirina kar û xebatan de, me yekem akademiya Perwerde û Lêkolînên Stratîjîk da vekirin.”

### Naverok û pîvanên wergirtina mamosteyan

Henan Inz derdarê rêvebirin û naveroka perwerdeye akademîyê de wiha got: “Yên ku li ser vê perwerdeyê disekinin ew kesên ku ji kevin ve di karê perwerdeyê de kar dikin û şêwiremendin li ser asteke bilind, mebesta me ew e ku em bighêjin armanceke serkeftî. Waneyên me jî bêtirî xwe girêdayî rêveberina rê û rêbazê sîstema kar, sîstema sekina mamoste û şêwazê danûstandinê ne. Herwiha ji pîvanên wergirtinê; hin mamoste li ser pêşinyara navendên perwerdeyê tevlî akadimiyê dibin, herwiha rêveberên ku asta wan di meşandina kar û rêbaz de qelsbe, tevlî akademiyê dibin. Dewreya akadimiyê 3’ê mehan dirêj dike, di navde 5 roj navbere.”



### ‘Ji bo pêşxistin û avakirinê pêwîstî bi perwerdeyê heye’

Berdevka Akademiya Perwerde û Lêkolînên Stratîjîk Henan Inz diyar kir ku akademî ji sê beşan pêk tê û wiha domand: “Perwerde li akademiyê li ser 3’ê beşan tê birêvebirin; beşa perwerde, beşa lêkolîn û beşa wegerê ye. Beşa lêkolînê, lêkolînên li ser awayê pêşxistina dibistan û kar de dikin, û piştre lêkolînên xwe pşiniyar dikin û em li gor ya rast û guncaw tev digerin wek nimûne; pirtûkxaneya dijîtal li ser van pêşinyran kar dikin û heya niha şêwazek hazirkirina û wê li ser 3’ê dibistana bikar bînin ku bi ser ket wê li hemû dibistanê din jî bikar bînin. Hejmara karmendan li gor rêziknamê 5 in du hevserokin, yek berdevkê komîta wegerê, yek komîta lêkolîna û yê din jî berdevkê komîteya perwerdê ye. û wekî din jî wê endamê werger, lêkolên û perwerdeyê jî hebin .”

Berdevka Akademiya Perwerde û lêkolînên Stiratîjîk Henan Iniz wiha axaftina xwe qedand: “Em bi hêvî ne ku mamoste û rêveberên ku tevlî perwerdeyê bûne serkeftî derbas bikin, herwiha mamosteyên ku bixwazin tevlî akademiyê bibin, navê xwe pêşinyar bikin.”

# Hêviya avakirina civakek azad

**Deriya Çiya\Qamişlo**

**Akademiya Civaka Demukratîk di sala 2013’an de li bajarê Amûdê bi navê akademiya Nûrî Dêrsimî hatiye avakirin, armanca wê jî rakirina hişmendiya hezarê salan û avakirina civak û kesayeteke azad.**



Akademiya civaka demukrat di meha 6an ji sala 2013’an de hat ragihandin. Kongireya yekemîn bi navê Nûrî Dêrsimî li bajarê Amûdê hat ragihandin. Piştî konfiransa wê ya yekemîn navê wê hat guhertin û ji navnenda Nûrî Dêrsimî bû Akademiya ronakbîrî û ramanên azad. Piştre bi navê Akademiya Civaka Demukrat hat ragihandin û tespîtkirin. Şaxên akademiyê li seranserî bakur û rojhilatê Sûriyê hatine avakirin.

### “Akademiya Civaka Demukrat hişmendiya hezarê salan têk bir”

Rêvebera Akademiya Civaka Demukratîk Şîlan Reşo derbarê Kar û xebatên Akademiya Civaka Demukratîk de wiha axivî:” Akademiya Civaka Demukratîk ji dema damezrandina wê heya roja îro li ser bingeha civakeke exlaqî, siyasî û di bin diruşmeya ronîkirin û azadkirina civakê hatiye avakirin. Akademî bi perwerdekirin û avakirina kesayetên civakê hatiya avakirin. Li ser vê bingehê jî kar û xebatên ku akademî dide meşandin ew e ku tevahî civak, pêkhate, endam û kesayetên xwende û nexwende yên di nava civakê de di perwerdeyê re derbas bike û wan li ser remanê azad pêşbêxe. Bi giştî em dikarin bêjin ku diruşmeya akademiya Civaka Demukratîk ji nûve avakrina civak û kesayetên azad e.” Herwiha zanebûn û perwerdekirin bingeha avakirina mirovan ne. Ji dema destpêkirina Şoreşa Rojava heta roja îro Akademiya Civaka Demukrat roleke pir girîng di nava civakê de lîstiye. Em van pêşketinan bi çavan dibînin û di nava civakê de guhertinên ku hatine çêkirin di milê pêşxistina hizrê ku bi salan di serê civakê de hatibû rûniştin û guhertina wê pêkanîn. Hişmendî û fikirê netewperestî, olperestî, nijadperestî ewqas di nava civakê de hatiye rûniştin, bi saya Şoreşa Rojava ya ku li ser bingeha azadiyê hatiya avakirin, Akademiyên Civaka Demukratîk dikarîbûn vê rolê bi awayekî serkeftî bilîze.

### “Şikenandine qalibên hişmendî ji şikandina atomê zehmetir e”

Şîlan balkişand ser zehmetî û pêwîstiya şikandina vê hişmendiyê û wiha pêde çû: Guhertin û veghuhertinên di nav van 10 salên şoreşê de, di warê hişmendiya civakê de, akademiya Civaka Demukrat bi gelek zehmetiya re derbas bû. Zehmetiyên ku hatin jîn jî, giştî di milê guhertin û veguhertina hişmendî û qalibên doxmatîk yên ku bi salan di hişmendiya mirov de hatine avakirin. Zehmetî di wir de ye ku em Karibn wan qaliban bidin şikandin, lewra Rêber Apo di parêznameya xwe de bi rengekî zelal dide nîşandan ku” şikandina qalibên hişmendî ji şikandina atomê zehmatir e.” Ger em ji dîroka destpêkirina civaka mirovahiyê ve heya roj îro bigrin dest, em ê bi awayekê zelal van guhertin û asta ku akademiyên Civaka Demukrat gihiştiyê û bandora wê li civakê bibînin.

Rêvebera Akademiya Civaka Demukratîk Şîlan Reşo dawî li axaftinên xwe anî û got: Şaxên Netewa Demukratîk li seranserî bakur û rojhilatê Sûriyê bi tevahî xwe birêxistin kiriye. Di hemû bajarên rizgarkirî û yên di bin siya Rêveberiya xweser de, Akademiyên Civaka Demukratîk li gor pêwîstî û bi zimanê wê deverê hatiya avakirin û bi rengekî serkeftî kar û xebatên xwe dide meşandin.

# Rojnamevan û pêşengê dîroka rojnamevaniya Kurdî Musa Anter

Li ser qetilkirina siyasetmedar, nivîskar, rojnamevan û yek ji pêşengên ku xetên nû di dîroka rojnamevaniya Kurdî de li Bakurê Kurdistanê kêşa Musa Anter ango Apê Musa re 31 sal derbaz dibin. Musa Anter rewşenbîrê ku dewlet ji pênûsa wî, heta ji fîtika wî ditirsiya.

Îro 31 sal li ser şehîdxistina siyasetmedar, nivîskar, rojnamevan û yek ji pêşengên ku xetên nû di dîroka rojnamevaniya Kurdî de li Bakurê Kurdistanê kêşa Musa Anter ango Apê Musa re derbaz dibin.

### Musa Anter kiye?

Mûsa Anter bi nasnav Apê Mûsa nivîskar û rojnamevanekî Kurd bû. Apê Musa di sala 1920’an de li gundê Zivingê ya bi ser navçeya Nisêbîn a Mêrdîn ya Bakurê Kurdistanê ji dayîkbûye.

Apê Musa, hîn di temenekî piçûk de, bavê xwe winda dike û li ber destên dayika xwe Fesla Anter mezin dibe.

Apê Musa di sala 1948’an de yurda Firatê vedike û dest bi derxistina rojnameya çavkaniya Dicle dike. Piştî çend salên dirêj li Amedê bi navê ‘Ileri Yurd’ ango Welatê Pêşketî dest bi derxistin rojnameyekê din dike.

Di destpêka salên 60’î de, di nava Partiya Çep ên Tirk de, bi awayekî fermî dikeve nava siyasetê.

### Dewleta Tirk bi şehîdxistina apê Mûsa xweset pêşiya ragihandina azad bigre

Di sala 1992’an de dewleta Tirk bi serokatiya Serokwezîra wê demê Tansu Çiler li Bakurê Kurdistanê li dijî nivîskar û kesayetên navdar ên Kurd dest bi pêngaveke xeternak kir.

Di encamê de nêzîkî 17 hezar kesayetiyên Kurd ji aliyê grûpa bi navê Hizbullah û dezgeha sîxuriya



Tirkiyê ve hatin kuştin. Weşanên wî “Birîna Reş” -”Ferhenga Kurdî” – “Hatiralarim” - “Band 1 û 2” – “Çinara Min” .

Roja 20’ê îlona sala 1992’an li kolanên Amedê ew bû hedefa dijminên çapemenî û ramana azad, ji aliyê JÎTEM’ê ve bi gulebaranê hate şehîdxistin.

Dewleta Tirk bi şehîdxistina Apê Mûsa hewl da ku rojnamegeriya Kurdî û fikra azadiya Kurd û bêdeng bike û bitepisîne, lê negîhîşt armanca xwe.

Îro li ser xeta Apê Musa bi hezaran rojnamevanên kurd têkoşîna xwe didomînin û pênûsa Apê mûsa li erdê nehiştin.



# Li hemberî tecrîdê çalakiyên Insiyatîfa Gel berdewam in

**Birûc Resûl / Qamişlo**

**Însiyatîfa Gel a Herêma Cizîrê di 9’ê Îlonê de bernameya xwe ya çalakiyên banga azadiya fîzîkî ya Rêber Abdullah Ocalan aşkere kir. Bi diruşma ‘Azadiya Rêber Apo misogeriya aştiyê li Rojhilata Navîn e’ çalakî û meş li tevahî bajarên herêmê dewam dikin.**

Di 10’ê Îlonê de li Dêrikê çalakiya konvedanê dest pê kir, konê çalakiyê li pêş Meclisa Malbatên Şehîdan a Dêrikê hate vedan û tê de wêneyên Rêber Abdullah Ocalan hatin daliqandin. Bi sedan şêniyên bajêr, gund û bajarokên wê, nûnerên meclis û saziyên sivîl beşdar bûn. Di 11’ê Îlonê de bi meşeke girseyî çalakî bi dawî bû. Di heman çarçoveyê de, di 15’ê Îlonê de li bajarê Dirbêsiyê çalakiya konvedanê dest pê kir, konê çalakiyê li çerxerêya Jin a li naverasta bajêr hat dayîn. Di çalakiyê de rêxistinên jinan, endamên Partiya Yekitiya Demokratîk (PYD), Tevgera Civaka Demokratîk (TEV-DEM) û şêniyên navçeyê tev li çalakiyê bûn, çalakiya konvednê di 16’ê Îlonê de bi xwepêşandaneke girseyî bi dawî bû.



Li bajarê Qamişlo jî bi heman armancê, di 23’ê Îlonê de çalakiya konvedanê dest pê kir. Di çalakiyê de bi dihan şêneyên bajarê Qamişlo tevlî çakaiyê bûn, wê çalakî di 24’ê Îlonê de bi meşeke girseyî bi dawî bibe.

Derbarê çalakiya konvedanê de rêveberiya Partiya Yekîtiya Demokratîk a bajarê Qamişlo Menîca Heyder ji rojnemeya me re axivî û got: “Em bi israrin ku vê tecrîda giran ya ku dewleta Tirk a dagirker li ser Rêber Apo feriz dike, bişkînin û Rêber Apo fîzîkî azad bikin. Rêber Abdullah Ocalan ji bo hemû gelên Rojhilata Navîn û tevahiya mirovahiyê berxwedaneke bê hempa dide meşandin, bi taybet ji bo azadiya jinê têkoşîneke mezin dike. Tevhaiya mirovahiyê deyndarên Rêber Apo ne. Em bang li hemû pêkhateyên herêmê, gelên Rojhilata Navîn û mirovên xwedî



nirx dikin ku li himberî tecrîda li ser Rêber Apo bêdeng nemînin û bi erkê xwe yê exlaqî rabin. Em ê li ser fikr û felsefeya Rêber Apo civaka xwe azad bikin û dagirkeran têk bibin.”

Hêjayî gotinê ku wê çalakiya konvedanê li bajarê Hesekê jî di 26’ê Îlonê de bê li dar xistin û di 27’‘ê Îlonê de bi dawî bibe.

# Bi çalakiyên tolhildanê HPG’ê bersiv da êrişên dagirkerên Tirk

**Di çalakiyên gerîla de yên ji bo tolhildana gerîlayên li Botan û Amedê şehîd bûn 12 leşkerên artêşa Tirk a dagirker hatin kuştin.**

HPG’ê li ser çalakiyên gerîlayên azadiya Kurdistanê yên li dijî artêşa Tirk a dagirker daxuyaniyeke nivîskî da. Daxuyanî wiha ye:

“Gerîlayên Azadiyê yên Kurdistanê bi rêbaza jiyan û ruhê fedaî yê Apoyî li ser şopa xeta şehîdan berxwedana xwe ya dîrokî dewam dikin. Ji bo bidin ser şopa armancên hevrêyên me yên şehîd û bilindkirina ala wan a têkoşînê, ji bo hilanîna tola fermandara me ya fedaî ya li Amedê şehîd bû hevrêya me Axîn Mûş û hevrêyên pê re şehîd bûn Egîd, Rohat û Demhat, ji bo hilanîna tola hevrêyê me Rênas ê li Botanê şehîd bû gelek çalakî hatin lidarxistin. Di van çalakiyan de ku ji bo bîranîna şehîdên me hatin kirin, 12 dagirker hatin cezakirin, 4 dagirker birîndar bûn, 2 kamerayên mobesse hatin îmhakirin. Her wiha derb li wesayiteke zirxî û 15 çeperan hate xistin. Berxwedana me ya destanî û têkoşîna me ya azadiyê heta serketinê bêteredût wê dewam



bike û teqez bi ser bikeve.”

### Li Herêma Rojavayê Zapê ya Şehîd Delîl;

Di 21’ê Îlonê de saet di 06:20, 06:30, 12:50, 14:30, 16:10, 17:00 û 19:50 li Qada Berxwedanê ya Girê Cûdî bi çekên giran li dagirkeran hate xistin. Derb li 7 çeperan hate xistin. Çalakî ji aliyê hêzên me yên YJA Starê ve hate kirin.

21’ê Îlonê saet di 06:50’î de li Qada Berxwedanê ya Girê Cûdî bi çekên giran li çepereke dagirkeran hate xistin.

21’ê Îlonê saet di 09:30, 11:45 û 20:50 de li Qada Berxwedanê ya Girê Cûdî bi sûîqestê li dagirkeran hate xistin. 2 dagirker hatin cezakirin, dagirkerek birîndar bû. Çalakî ji aliyê hêzên me yên YJA Starê ve hate kirin.

21’ê Îlonê saet di navbera 21:40 û 23:15’an de li Qada Berxwedanê ya Girê Cûdî bi çekên giran dest li helîkopteran hate werdan.

22’ê Îlonê saet di 00:40, 01:00, 03:30 de li Qada Berxwedanê ya Girê Cûdî bi çekên giran li dagirkeran hate xistin, derb li 3 çeperan hate xistin. Çalakî ji aliyê hêzên me yên YJA Starê ve hate kirin.

21’ê Îlonê saet di 06:45, 17:45, 17:48 û 19:25’an de li Qada Berxwedanê ya Girê Amediyê bi eçkên giran li dagirkeran hate xistin. Derb li 4 çeperan hate xistin.

21’ê Îlonê saet di 08:30 de li Qada Berxwedanê ya Girê Amediyê kamerayeke mobesse ya dagirkeran bi sûîqestê hate îmhakirin.

21’ê Îlonê saet di 16:50’î de li Qada Berxwedanê ya Girê Amediyê li dijî dagirkeran çalakiyeke êrişê hate kirin. Bi bombeyên destan û çekên ferdî çalakî hate kirin û di encamê de 4 dagirker hatin cezakirin.

21’ê Îlonê saet di 17:30’î de li Qada Berxwedanê ya Girê Amediyê bi sabotajê li dagirkeran hate xistin, 2 dagirker hatin cezakirin.

21’ê Îlonê saet di 18:45’an de li Qada Berxwedanê ya Girê Amediyê bi çekên nîv otomatîk li dagirkeran hate xistin, dagirkerek hate cezakirin.

21’ê Îlonê saet di 19:25’an de li Qada Berxwedanê ya Girê Amediyê sîstemeke kamera ya mobesse ya dagirkeran hate îmhakirin.

21’ê Îlonê saet di 19:25’an de li Qada Berxwedanê ya Girê Amediyê bi sûîqestê dagirkerek hate cezakirin.

21’ê Îlonê saet di 10:20’î de li Qada Berxwedanê ya Girê FM’ê bi çekên nîv otomatîk li wesayiteke zirxî ya dagirkeran hate xistin.

### Li herêma Metînayê;

21’ê Îlonê saet di 06:30’î de li Qada Berxwedanê ya Girê Ortê bi sabotajê li dagirkeran hate xistin. Piştre jî bi çekên nîv otomatîk li dagirkeran hate xistin. Di çalakiyê de 2 dagirker hatin cezakirin, 3 dagirker jî birîndar bûn.

21’ê Îlonê saet di 22:20’î de li Qada Berxwedanê ya Girê Ortê hêzên me dest li liv û tevgera helîkopteran werdan. Piştî destwerdana hêzên me helîkopter neçar man ji qadê biçin.

### Êrişên artêşa Tirk a dagirker;

21’ê Îlonê Qada Berxwedanê ya Girê Bahar a li Rojavayê Zapê ya Şehîd Delîl carekê, qadên Gundê Şêlazê û Gundê Bêşîlî yên herêma Metînayê 4 caran bi giştî 5 caran bi balafirên şer hatin bombekirin.

21’ê Îlonê Herêma Rojavayê Zapê ya Şehîd Delîl û Herêma Metînayê bi helîkopterên êrişê hatin bombekirin. Herêmên Zap, Rojavayê Zapê ya Şehîd Delîl û Metîna bi topan hatin bombekirin.”

# Bazariyên li ser partiyên Rojhilatê Kurdistanê

**Navenda nûçeyan**

**Proseya veguhestina çekdarên partiyên opozîsyona Rojhilatê Kurdistanê yên Îranê ji xaka Herêma Kurdistanê bi dawî bû û heta niha 9 hezar endam û malbatên wan 80 kîlometre dûrî sînorên navneteweyî yên Iraqê-Îranê hatine dûrxistin. Herwiha Îran daxwaza radestkirina 38 pêşengên partiyên Rojhilatê Kurdistanê dike.**

Çavkaniyên ewlekariya niştimanî ya Iraqê ragihandin, heta niha 9 hezar endamên hêzên opozîsyona Îranê (partiyên Kurd yên Rojhilatê Kurdistanê) û malbatên wan bo




deverên dûrî sînor hatine veguhestin.Hevdem li gel radestkirina çekan, biryare şandeke leşkerî ya Îranê ji bo cîbicîkirina yek ji xalên rêkeftina ewlehiyê ya di navbera herdû welatan de, serdana sînor bike.

Li gorî çavkaniyek ji ewlekariya Nîştimanî ya Iraqê ji rojnameya Qeterî Al-Arabiye El-Jadeed (El-Erebiye El Cidîd) re ragihandiye ku pêvajo berdewame û ji bo ku xwe ji senaryoyeke leşkerî ku qezenca tu aliyan têde nîne dûr bigirin, komên opozisyona Kurd jî nêzîkatiyeke erênî nîşanî Bexda didin. Wî got ku Tehranê bi fermî daxwaza radestkirina 38 pêşengên (serkirde) van partiyan kiriye, lê Iraq red dike ku cihê endamên komên opozîsyonê û malbatên wan eşkere bike û radestî Îranê bike.

Derbarê proseya bêçek kirina hêzên partiyên Rojhilatê Kurdistanê de jî çavkaniyê eşkere kir ku cîhên guncaw û ewle li deverê hatine dabînkirin û got; “Bi dûriya ne kêmtir ji 80 kîlometran, li ser sînorê navdewletî yê Iraqê li gel Îranê û proseya bicihkirina wan jî bi amadebûna nûnerên Neteweyên Yekbûyî pêk hatiye û rasterast beşdarî lihevkirina ewlehiyê bûye. Ev jî ji bo parastina serweriya Iraqê û nehiştina her cûre tevgereke leşkerî ya Îranê li hindirê Iraqê hatiye îmzekirin.

Biryare şandeke leşkerî ya Îranê bi awayekî fermî serdana sînoran bike. Armanc ji serdanê ew e ku hemû baregehên partiyên Kurdên Rojhilatê Kurdistanê werin veguheztin. Ji bo cîbicîkirina bendên din yên peymanê, ji ber ku veguheztina baregehên hêzên Rojhilat tenê bendek ji lihevkirina Iraq û Îranê ye.

Nuqteya nakok a di navbera Bexda û Tehranê de li ser lihevkirinê daxwaza radestkirina kesên daxwazkirî yên ji aliyê Îranê ve ye ku li ser Bexda ferz dike ku hejmarek ji kesayetiyên navdar û pêşeng yên partiyên Rojhilatê Kurdistanî ye. Lê Iraq heta niha tu bersiveke erênî ji bo radestkirina van kesên ji aliyê Îranê ve tên daxwazkirin, nedaye Tehranê.

# Perwerdeya Ku Heqîqetê Navend Digire...(1)

Volqan Elî

Li gorî vê; perwerde, takekes û civakê ber bi armanca jiyanê ve dibe, ber bi heqîqeta jiyanê ve dibe. Ev nêzîkbûna perwerdeyê xwediyê feraseteke azadîxwaz e. Perwerdeya ku heqîqetê navend digire, di heman demê de feraseta perwerdeyê ya civaka demokratik e. Ji bo civaka demokratik, perwerde ew e ku takekes û civak bi rêya wê xwe bigihîne agahî û heqîqeta jiyanê. Di perwerdeyê de heqîqet esas e, heqîqeta civakê jî jiyana azad e.

Mirov ji ber ku xwediyê meraqê ye û dikare empatî çêbike, bi bûyerên ku li derdorê diqewimin re zêde zêde eleqadar bûye, ew şopandine û encam jê derxistiye. Çi jê re lazim bûye, berê xwe daye wan tiştan û di vê armanca xwe de jî merhaleyên mezin derbas kiriye. Vê, kiriye ku jiyana civakê hêsantir bibe. Dema ku civakbûyîn dest pê kiriye, rewşa jê re hefizaya şirîk tê gotin, yanî çand çêbûye. Jin dayika ku civakbûyîn afirandiye ev hefizaya şirîk, ev çand derbasî nifşên nû kiriye. Ji ber vê yekê di maneyekê de jin dayik mamosteya destpêkê ye. Lê xebata jin dayikê ya derbaskirinê ya li vê derê, ne ku hin tiştan bi nifşên nû bide dubarekirin, armanca wê ew e ku nifşên nû ji bo jiyanê amade bike. Ji ber vê yekê, xebata derbaskirina çandê ne ku di encemê de hin tiştan bide jiberkirin. Yanî armanc ne ew e ku tenê agahî bide; ji bo ku fêrî jiyanê bibin, jiyanê bialimin nifşên nû beralî dike.

Çavkaniyên dîrokî-felsefî dinivîsin ku Emanuel Kant di dersekî xwe de ji xwendevanên xwe re wisa dibêje; "Hûn ê ji min ne ku fikr û ramên amade bialimin, fikirandinê bialimin. Yan jî dibêjin Mao wisa gotiye, "Masiyan nedin ti kesî, wan bialimînin ku masiyan bi destê xwe bigirin". Vaye ev gotin jî tê heman maneyê. Ev fikr û ramanên ku armanca rast a perwerdeyê, di rastiya xwe de terza jiyanê ya civaka xwezayî îfade dikin. Jin dayik ji ber ku li nifşê nû dinêre, xizmeta wan dike, heya bi astekê digihîne û terbiye dike, ew bi xwe derdikeve asteke pîroz; cihên bi kar tîne jî piştre dibin perestgeh (mabedcihê îbadetê). Di civaka xwezayî de kar û xebata esasî ya perestgehan ev e. Di heman demê de ev peresgetgeh bi rola dibistanên serdemê radibin. Armanca van mabedan ne tenê dayina agahiyê ye, hedef ew e takekes ji bo jiyanê amade bike. M. A. Ferriere wisa dibêje; "divê dibistanên tenê agahî didin xwendevanên xwe, ji holê werin rakirin". Ew bi vê gotina xwe bêyî ku pê bihese rastiyeke heqîqetê tîne ziman.

Di perwerdeya ku heqîqetê esas digire de armanca bingehîn ew e ku dil (wijdan-exlaq) û hiş bi hev re werin perwerdekirin û bi vî şiklî takekes ji bo pêşerojê, ji bo civakê amade bike. Di vê wateyê de jiyan bi xwe perwerde ye. Di perwerdeya heqîqetê bingeh digire de pîvan, ew feraseta ku Zerdeşt di ateşgedeyên xwe de dida şagirtên xwe; "Baş bifikire, baş bêje, baş pêk bîne". Ev perwerde li gorî îhtiyacên bi pêş ketiye, bi pêş dikeve.


Hin pedagogên perwerdeyê û psîkologên ekola refdariyê modelên perwerdeyê yên xwe disipêre bandorbertekê û hewl dide reftariyekê, şiklekê bide qezenckirin. Vaye rêbaza vê perwerdeyê îro tevahî cîhan û em jî niha bi kar tînin. Çi ye ev rêbaz? Rêbaza îmtihanan. Em çi dikin? Demeke diyar em perwerde didin xwendevanan û paşê di ezmûnekê re derbas dikin. Eger tiştê em dixwazin di asta em dixwazin de fêr nebûyîbe em wan ceza dikin. Yanî noteke nebaş didinê. Rêbaza bandor-bertekê de di fêrkirinê de ev e: em xwendevan ji ber ku kêm fêr bûye ceza dikin. Yanî bandorekê lê dikin. Bi nota zayif, armanc ew e ku xwendevan zanibe çima noteke zeyif girtiye. Piştî ku xwendevan vê dizane wê bixebite û nota xwe ya azmûnê baş bike. Yanî mijara xwe ya perwerdeyê bialime. Em dixwazin yan jî armanca me ew e ku xwendevan bi vî şiklî berteka nota me ya zeyif bide. Ev feraseta perwerdeyê, wekî ekola reftariyê tê naskirin. xwe didpêre ceribandina zanyarekî yê bi navê Pavlov. Ev kes qaşo ji bo ku merhaleyên fêrbûna di zindiyan de bişopîne ceribandineke wisa dike; ji bo ceribandinê quçikekî peyda dike. Destpêkê bi awayê ku kûçik bibihîze çend caran li fîtikê dide yan jî dengekî bi rêkûpêk derdixe. Kûçik ti bertekan (ritfal) nîşan nade. Piştre destpêkê li fîtikê dide û di peyre jî goşt (nota baş) dide kûçik. Vê caribandina xwe bi caran bi caran dubare dike. Êdî kûçik dema dengê fîtikê dibihîze, dizane (fêr dibe) ku di pey wê re wê gotş bixwe, gilêz bi devê wî dikeve. Pavlov çend caran bêyî ku goşt bidê, li fîtikê dixe. Dîsa gilêz bi devê kûçik dikeve. Di encam de Pavlov digihêje vê qeneatê, dibeje ku "eger kûçik fêr bûyîbe di navbera fîtik û goşt de têkiliyek heye, ev rastî wekî rêgezeke fêrkirina mirov jî dikare were bikaranîn. Yanî eger xwendevan wekî em dixwazin bixebite noteke baş heqê wê/î ye. Eger na, bila noteke şikestî bigire da ku fêrî dersên xwe bibe." Dibe ku ev rêbaz ji bo fêrbûna heywanan rast be lê ji bo fêrbûn û alimîna mirovan ne ku tenê têrê nake li dijî tebîeta mirov e jî. Ev rêbaza (ezmûn-notên baş û nebaş) ku em di perwerdeya xwe de jî bi kar tînin xwe dispêre vê caribandina Pavlov.

Perwerdeya xwe dispêrea alimîna heqîqatê ne wisa ye. Ev feraseta perwerdeyê ku tenê bi reftarî û hareketa xwendevan mijûl dibe, ku bi cihana mirov a hindurîn, bi manewiyat û psîkolojiya mirov mijûl nabe, feraseta bingehîn a hêzên desthilatdar e. Li gorî vê feraseta perwerdeyê tu çi hîs dikî, çi dixwazî, çi qebiliyet û hunera te heye, ew ne girîng e, ya girîng ew e ku xwediyên desthilatdariyê çi dixwazin.

Perwerdeya heqîqetê esas digire bi qasî ku neyê daxistin asta perwerdeya xwe disipêre reftariyan, berfireh e. Ya hê rastir ew e ku divê ev perwerde bi her aliyê jiyanê re eleqadar bibe. Di vê maneyê de hewce ye xwediyê taybetmendiyeke ku jiyanê hêsantir dike, xweşiktir û bi manedartir bike, pirsgirêkan çareser bike û afirîneriyê esas bigire. Ev perwerde hesab dike ku qebiliyet û kêrhatinên mirovan, astê wan ên fêmkirinê, tiştê ku dixwazin fêm bikin ji hev cuda ye.

Di perwerdeya heqîqetê esas digire de di navenda kar û xebata perwerdeyê de xwendevan heye, têkiliyên mamoste-xwendevan ên kevn hatine derbaskirin, mamoste tenê rê pêş xwendevan dike yan jî ji bo ku xwendevan mijara xwe fêm bike alîkarî didê. Mînak di vê mijarê de Sokrates dibêje; "rola mamoste tenê ew e ku di kar û xebata perwerdeyê de wekî pîrikekê tevbigere. Pîrik çi ye û ji bo ku dayikek zaroka xwe bîne, çawa alîkariya dayikê dide tê zanîn. Ya din jî hewce dike mamoste ji bo ku mejiyê xwendevan hişyar bike dersê bide wan, ne ku hewl bide wan bi xwe bide bawerkirin." Gava ku Rêber Apo dibêje, "Li akademiyên min têkiliya xwendevan-mamoste tine" tam jî balê dikişîne li ser vê heqîqetê. Xwendevanên timî tiştên mamoste dibêjin guhdar dikin, ne gengaz e bi pêş bikevin. Şêx Beddrettin dibêje, "ew xwendevanê/a ku li mamosteya/ê xwe derbas nekiriye, tê maneya ku xiyanet li zanistê kiriye". Di mijara perwerdeyê de em rewşeke wisa di civak û dîroka Kurdistanê de jî dibînin. Ev erd, ew cih û war in ku mirovahî li vê derê derbasî jiyana civakî û neolîtîkê bûye. Li vê erda ji vê jiyanê re bûye navend, perwerde, ji bo ku civak xwe bigihîne maneya jiyanê û ji bo jiyanê xwe amade bike ji aliyê jin dayikê ve hatiye dayin. Perestgehên Xwedavenda dayikê, perestgehên Îştar mînakên vê ne. Lê belê dema ku hêzên dagirker Kurdistanê dagir dikin, ev rewş hatiye guherîn. Piştî dagirkeriya leşkerî, karê ku destpêkê kirine destdanîna li ser van perestgehan û dûrxistina ji cewhera wan e. Cih û warên pîroz ên xwedavend dayikê, kirine mûsaqadîme (kerxane) û zivirandine mekanên xistina civakê

## Jîna Emînî, Dewleta Îranê Dihejîne!



Ahmet Aktaş

16ê Îlonê(2022), salvegera yekê ya şehadeta jina têkoşer û berxwedêr Jîna Emînî bû.

Di Îlona par de, polîsên bê"exlaq" ên Tehranê, jina Kurd Jîna Emînî, destgîr kirin û di nava du rojan de, bi êşkenceyê şehîd kirin.

Li dijî vê êrîşa dewleta Îranê ya xwedî zihniyeta mêr a zulumkar û koledar, bi pêşengiya jinên Kurdistanî, jinên Îranî rabûn serhildanan.

Di vê astê de rabûna jinan, heybeta wan, dirûşmên wan ên watedar û roj bi roj mezinbûna van serhildanan, ku li Îranê cara yekê bû, dewleta diktator a meleyan gelek tirsand.

Çima gelo, ji bo çi ewqas ev dewlet xiste nava xof û tirsê?

Ji ber ku, vê carê bûyerek ji rêzê nehat dîtin û jinan weke berê pêşewazî ne kirin, belê cara yekê bû ku bûyerek wisa bi hişmendî himbêz kirin û li dijî dewletê bi lez bertek nîşan dan.

Cewherê vê serhildanê, ne bi tenê hestiyariyek takekesî bû. Belê bi naverokek tije bîrdozî, siyasî û civakî bû.

Jixwe di dirûşma wê de ya JIN JİYAN AZADÎ de jî, cewherê vê rabûnê gelek aşkere hat dîtin. Lewra çavkaniya vê dirûşmê felsefeya Rêber APO bû.

Ji vê kaniyê, ne tenê Jîna Emînî av vexwaribû. Hevalên/hevrêyên wê yên berî wê jî hebûn; Zîlan, Bêrîtan, Viyan, Şîrîn Elemhûlî, Arîn Mîrkan, Sakine Cansiz, Evîn Goyî û hwd.

Ji ava kaniya vê felsefe û bîrdoziyê, van leheng û pêşengên şoreşa gelê Kurdistanê hatine afirandin.

Ji vê pêşengiya jinê ya şoreşa civakî, ne tenê dewleta Îranê, belê her çar dewletên dagirker Tirkiye, Iraq û Sûriye jî pir ditirsin. Loma êrîşên wan ên sereke li dijî van jinên zana û pêşeng in.

Bêgûman êrîşkarê herî mezin û xwînwar dewleta tirk e. Ya jî bi gotinek din, yê pêşengtiya van êrîşan dike dewleta tirk e.

Jixwe li vira divê mirov bala xwe bide êrîşa li ser Imraliyê; bala xwe bide helwest û tecrîda giran a li ser Rêber APO.

Erê, bi giştî êrîş li ser doza azadiya gelê Kurdistanê û Tevgêra Azadiyê ye, lê bi taybetî êrîşa herî mezin li ser Rêber APO û jinên pêşeng e. Çima? Ji ber ku mîmar û afrênerê vê bîrdozî û felsefeya hemdemî Rêber APO ye, loma armanca êrîşa sereke ew e.

Lê ji ber ku di vê felsefê û vê bîrdoziyê de, rola pêşeng daye jinê û bîrdoziyek taybet, jinolojî lê zêde kiriye, loma jina pêşeng a Kurdistanî jî, li gel Rêber APO bûye armanca ewil û bingehîn.

Îca li vira bêdengî û piştgiriya bi dewleta tirk re, ya dewletên hegemonên cîhanê jî, mirov dikare nas bike. Ji ber ku sistema modernîta kapitalîst a cîhanê, ji vê sistema ku Rêber APO afirandiye û bi pêşengiya jinê xistiye meriyetê/pratikê ne razîne, ji bo sistema xwe alternatîf/berdêl dibînin.

Weke mînak;, êdî gav bi gav jinên cîhanê jî li dirûşma JIN, JIYAN, AZADÎ xwedî derdikevin û di vê çarçovê de tevdigerin. Herwiha, felsefeya Rêber APO, bi giştî li gelek xwendegehên cîhanê hatin pejirandin.

Xwepêşandan û geşedanan, ne tenê dewleta Îranê, belê hemû dewletên xwedî zihniyeta mêr/zilam dihejîne.

# 'Bi berxwedaniyê wê xiyanet û dagirkerî têk biçe'

Avesta Menaf/Qamişlo

**Dewleat Tirk a dagirker û bi hevkariya PDK'ê, êrîşên xwe yên li dijî hebûna gelê Kurd dewam dike, Sekreterê Partiya Demokrat a Kurdistanê-Sûriye (PDK-S) Ciwan Siko diyar kir ku wê bi vîn û berxwedaniya gelê kurd xiyanet û planên dagirkeriyê têk biçin.**

Dewleta Tirk a dagirker ji bo tekbirina vîna gelê kurd bi tevahiya hêza xwe êrîş destkeftiyên gelê kurd dike. Lê Li hemberî berxwedaniya bê hempa ya Tevgera Azadiya Kurdistanê, planên dagirkeriyê têk diçin. Dagirkeriya Tirk wekî her çar PDK 'ê bi kar tîne û wê ji xwe re dike amûr, da ku planên xwe pêk bîne. Xiyaneta PDK'ê jî ne tiştekî nû ye, ev partî ji destpêka damezrandina xwe ve heta niha li dijî tevger û destkeftiyên gelê kurd bi dijminê kurdan re hevkariyê û xiyanetê dike.



Derbarê xiyaneta PDK'ê û hevkariya wê ya bi dagirkeriya Tirk re, sekreterê Partiya Demokrat a Kurdistanê-Sûriye (PDK-S) Ciwan Siko ji rojnemeya me re axivî.

**'PDK`ê dixwaze destkeftiyên gelê kurd tune bike'**

Ciwan Siko diyar kir ku di êrîşên dagirkeriyê de yên li dijî Qadên Berxwedanê, PDK'ê bi awayekî eşkere xiyanetê dike û wiha domand: "Êdî xiyanet bûye rêbaza PDK`ê, ev ji gelê kurd re ne nûye. Dewleta Tirk a dagirker ku êrîşên xwe li ser Tevgera Azadiyê roj bi roj zêde û girantir dike, hewil dide gelê kurd qir bike, ev 100 salin ku êrîşên dewleta Tirk li ser gelê kurd berdewam dike. Dewleta Tirk û bi hevkariya PDK`ê dixwaze tevahiya destkeftiyên gelê kurd têk bibe û kurdan tune bike."

**'Bi têkoşînê dagirker têk diçin'**

Siko da zanîn ku Tevgera Azadiya Kurdistanê ji bo azadiya gelan, xwe feda dike û wiha got: Mala Barzanî herdem destekê dide dewleta Tirk a dagirker û hewil dide Tevgera Azadiyê têk bibe. Ji ber ku Tevgera Azadiyê ji bo gelê kurd xwe feda dike, ew dibe armnaca dagirkeriya Tirk û PDK'ê. Eger ne bi berxwedaniya Tevgera Azad ba, wê PDK'ê tevahia Başûrê Kurdistanê radestî dijmin û dagirkeran kiriba."

**'Dagirkerî ji bo ku bighêje armnaca xwe mala Barzanî bikar tîne"**

Sekreterê Partiya Demokrat a Kurdistanê-Sûriye (PDK-S) Ciwan Siko Ciwan Siko axaftina xwe wiha qedand: "Êdî PDK'ê di cîhanê de xwe îspat kir ku di warê însanî, civakî û di hemû warê jiyanê de xeta îxanetê jî derbas kiriye. Bi destê mala Barzanî, bi 10'an şoreşgerê kurd yên Tevgera Azadiya Kurdistanê tên şehîd xistin. Îro zarokên me li çiyayên azad li ber xwe didin, li hemberî wan jî PDK'ê xeta xiyanetê dide meşandin û wan dike hedefa xwe. Dewleta Tirk jî bi destê mala Barzanî dixwaze bigihije encama xwe."



# 'Jin pêşenga jiyana azad e'

Endama Kordînasyona Kongra Star Remziya Mihemed diyar kir ku xwepêşandanên li tevahî sûriyê û bi taybet li herêma Siwêdayê hatine li darxistin û berdewamin, armanca wan guhertina sîstema navendî û hişmendiya dewlet ntewa heyî ye.

Ronaz Silêman/Qamişlo

Gelê Siwêda yê ev derdorî mehekî ye ku li hemberî sistemê navendiya hikumeta şamê di nava xwepêşandanên girseyî de ye. Armanc jê ku sîstema heyî bê guhertin û aloziya aborî were çareserkirin. Herwiha di çarçoveya sistemê rêveberiya xweser de gel bikaribe xwe bi rêve bibe û rewşa heremê ji hemû milî ve di ber çavan re were derbas kirin û hikûmet li daxwazên gel guhdarî bike û guhetinên pêwîste çêbike.

Derbarê pêşengitiya jinê ji xwepêşandanê Siwêdayê re, endama qordînasyona kongra star Remziya Mihemed ji rojnama me re axifî.

Remziya Mihemed diyar kir ku xwepêşandên li tevahî sûriyê bi taybet herêma Dera û Siwêda yê, ji sala 2011`an de dest pê kiriye û wiha got: " Çirûzka xwepêşandanê ji herêma Siwêdayê destpêkir. Xwepêşandanên li Siwêda bi pêşengtiya jinê hatin destpêkirin û roj bi roj ev xwepêşandan berfireh bûn û gelek bajarên din jî tevî bûn û armanca van xwepêşandanan ew e, ku li seranserî Sûriyê sîstema hikûmeta heyî ji bingeh ve were guhertin. Sîstema rêveberiya bakur û rojhilatê sûriyê mînaka herî guncawe ji bona çareseriya hemû hêşeyên Sûriyê û pêwîste gelê Siwêdayê sûdê ji vî sistemî bigre, ji ber ku riya serkeftinê sistema rêveberiya xweser e. Weke ku tê zanîn her tim gelê Siwêdayê li hemberî alûziya sûriyê û hişmendiya hikûmeta şamê serî rakiriye û bi çalakiyên aşîtane nerezîbûna xwe daye nîşandan. Ji ber vê yekê her tim ji milê hikûmeta şamê ve li ser herma Siwêda siyaseteke taybet hatiye meşandin û xwestine ku bi riya binçavkirin, tirsandin, êrişan û şerê taybet ê ku li ser civakê tê meşandin



armanca van xwepêşandanan vale derxînin. Daxwazên xwepêşandêrên Siwêdayê yê, dibe ku başkirina rewşa abûrî û jiyanî jî di nava xwe de bige, lê di bingehê xwe de armanca van xwepêşandanan guhetina bingehîn di sistem û hişmendiya dewletê ye.

**'Şoreş û xwepêşandan 11 salin berdewame'**

Remziya Mihemed anî ziman ku roj bi roj meş mezin dibin û wiha got: " Xwepêşandêr daxwaza berdana girtiyên siyasî û pêkanîna guhertina demokratîk dikin. Em dixwazin ku rêveberiya xweser bi gelê siwêda re bibe alîkar û sîstema ku li bakur û rojhilatê sûriyê hatî avakirin bi gelê Siwêda re parve bike, da ku gelê Siwêda jî bighêje asta ku bikaribe bi riya avabûna rêveberiya xwe ya xweser hermên xwe bi rêve bibe.

Herwiha sîstema ku li ser sûriyê û rojhilata navîn tê meşandin sedsaliya lozanê derbas kiriye guhertina nû ya ku di siyaseta cîhanî de bi taybet dewletên desthilatdar dixwazin li gor xwe carek din pirojeyeke nû bidin avakirin. Bi dirêjiya 11 salan ji şoreşa Sûriyê de, ji ber ku li ser erdê ji milê gel ve tu guhertin nayê dîtin, gel jî ji vê yekê bêzar dibe û li hemberî vê yekê jî tu sebra gel nemaye û dixwaze ji vê rewşa heyî di zûtirîn dem de derkeve.

Li beramberî vê rewşa ku li seranserî Sûriyê tê jiyan kirin, tekoşîn û berxwedana gel bê navber didome û gel gihiştiye wê baweriyê ku êdî tu niyeta sistemê ku xwe biguhere nîne.

**'Pêwîste li hemberî hişmendiya dewletê her kes rabe ser piyan'**

Remziya Mihemed wiha berdewamî da axaftina xwe û got: Pêwîste ji bo berjwendiyên gel û civakê fikirandin çêbibe û "Heger guhertinek li gorî îrada gel çênebe, wê xwepêşandan li her derê hebe. Hişyarî di nav tevahî pêkhateyên herêmê de çêbûye û Siwêda jî weke çawa bakur û rojhilatê sûriyê bi hemû pêkhateyên xwe bi hev re jiyan dikin, bajarê Siwêda jî





bi vî rengî dikare sistema xwe ava bike. Herwiha guhertina ku heta niha çênebûye ne ku xwepêşandanin gel kêm û lawaz dimînin, lê ji ber ku beşek ji civakê cihê xwe di nava xwepêşandanan de digre û beşê din jî bi rejîmê re hevkariyê dike, an jî li rewşa heyî temaşe dike. Ji ber vê yekê ne gengaze ku di demeke kin de guhertin û vehuhertinan ku tê xwestin li ser erdê pêkwere.

**'Destwerdanên hêzên derve dixwazin rewşa heyî berûvajî bikin'**

Remziya Mihemed diyar kir ku siyaseta li ser Sûriyê tê meşandin di hundir de parçebûneke mezin daye avakirin û got: " xaka sûriyê hatiye firotin û gelê sûriyê bi erda xwe re hatiye firotin bêyî ku pê bihise. Sîstemên serdest ji bona ku hemû hewildanên gel ji bona gihiştina mafê xwe bê encam bimîne, wê her tiştî bikin. Pêwîste ku gelê Sûriyê nehêle tu hêzên biyanî destwerdana hindirê Sûriyê bikin, ji ber ku her hêzekî li gorî berjewendiyên xwe tevdigere û kes hayê wî li gel û daxwazên gel nîne. Heger guhertina pêwîste ne bi destê gel be, wê tu carî nekeve xizmeta gel. Jin di asta pêşengtiyê de cihê xwe di xwepêşandanên Siwêda de digre û bi rengekî çalak tevlîbûna xwe ji hemû xebatên siyasî re jî dide çêkirin.

Jinên Siwêda wêneyên Hevrîn Xelef hildan û li bajarê Elmaniya jî bi navê Hevrîn Xelef û gelek şehîdên ku di serhildanên "jin jiyan azadî" de û di şoreşa rojava de şehîd ketine têne rakirin. Ev tê wê wateyê ku ilhama şoreşa jinên rojava bandoreke sereke li xwepêşandanên Siwêdayê kiriye."

**'Pêşengtiya xwepêşandanên Siwêda yê jin e'**

Endama Kordînasyona Kongra star Remziya Mihemed wiha axaftina xwe qedand:" 11 salin ku gelê Siwêda daxwaze mafê xwe dike, lê her car rastî zehmetî û astengiyan tê, lê vê carê û bi pêşengiya jinan girseya xwepêşandanê Siwêdayê roj bi roj mezintir dibe û bandora xwe jî, ji hemû xwepêşandanên beriya neha bêtir e. Ezmûna ku jinên Kurd li Rojava têre derbasbûn û heyanî roja îro jî di avakirina civakê de cihê xwe digrin, ji bona jinên Siwêda û tevhiya cîhanê bû çavkaniya, hêz, bawerî û ilhamê. Cîgirtina jinên Rojava û di hemû qadên jiyanê de, bû çavkaniya coş û kelecanê ji bona jinên Siwêda û tevahî jinên Sûriyê. Şoreşa jinên rojhilatê Kurdistanê ya ku bi diruşmeya "Jin Jiyan azadî" dest pêkir û heyanî roja îro bi hemû hêza xwe berdewam e, ji tevahî jinên Sûriyê û rojhilata navîn û cîhanê re bû ronahiya riya azadiyê. Ev felsefe felsefeya Rêber Apo ye. Rêber Apo ji zaroktiya xwe ve ji bona azadiya jin û civakê her tim di nava tekoşîneke bê sînor de ye. Ji ber ku rêber Apo gihişte wê baweriyê ku azadiya Kurdistanê û xilasiya mirovahiyê bi azadiya jinê ve girêdayî ye. Ji bona vê yekê pêwîste ku li seranserî Sûriyê tevahî jinên azadîxwaz bibin yek ji bona ku dawiya zilim, zordarî, şer, wêran û koletiyê bînin û jiyaneke azad û wek hev ava bikin.

# 'Êrîşa li ser Nivîsgeha KNK'ê armancgirtina hevrêziya kurdî ye'

Reşo Mihemed/ Qamişlo

Êrîşên dewleta Tirk a dagirker yên ser gelê Kurd bênavber dewam dikin, herî dawî jî li ber çavê PDK'ê li dijî Nivîsgeha KNK'ê ya li Hewlêrê êrîşek pêk hat. Cîgira heserokatiya KNK'ê Hêvî Mustefa da zanîn ku armanca êrêşên dagirkeriya Tirk, qirkirina gelê kurd e û got, êrîşa li ser navenda KNK 'ê armancgirtina yekrêziya kurdî ye.

Dewleta Tirk ya dagirker bi awyekî bênavber êrîşî Başûrê Kurdistan, Şengal û bakur rojhilatê Sûriyê dike, di heftiya derbasbûyî de ji bo pêkanîna pilanên dagirkeriyê ev herêmên tên êrîşkirin daye ber gefdanên dagirkerinê.

Dagirkeriya Tirk di 17'ê Îlonê de, li Kantona Qamişlo bi riya balafireke bêmirov erebeya endamên Hêzên Ewlekariya Hundrîn bombebaran kir. Di encamê 2 endamên Hêzên Ewlekariya Hundirîn şehîd bûn.

Di 18'ê Îlonê de balafirxaneya çandiniyê ya Erbet ya girêdayî Silêmaniyê ji aliyê balafira bêmirov ya Tirkiyê ve hat armancgirtin. Di êrişê de 3 endamên Dijî Terora Herêma Kurdistanê şehîd bûn.

Herwiha di heman rojê de jî êrişek hovane li ser Nivîsgeha KNK'ê ya li Hewlêrê pêk hat. Di encamê vê êrîşê de jî berpirsê Nivîsgeha KNK'ê Denîz Bulbun gihaşt asta şehadetê. Ev nivîsgeh jî di sala 2006'an de bi awayekî fermî hatiye vekirin. Cihê nivîsgeha di nava bajarê Hewlêrê de ye. Di heman demê de ji aliyê asayîş û istixbarata herêmê ve 24 saetan tê şopandin. Lê weke tê xuyakirin destê istixbarat û asayîşan di vê êrîşê de heye.

Ev hemû êrîş di demeke nêzî hev de li ser asta Başûr û Rojavayê Kurdistanê hatin pêkanîn. Ev yek jî siyaseta dewleta Tirk ya faşîst û qirker e ku li ser gelê kurd dide meşandin. Êrîş û pilanên dagirkeriya Tirk hîna jî li ser herêmê berdewam in û PDK'ê di vî warî de hevkar e. Girêdayî êrîşên dagirkeriya Tirk yên ku li ser herêmê tên pêkanîn cîgira hevserokatiya Kongra Netewî ya Kurdistanê (KNK) Hêvî Mustefa ji rojnameya me re axivî.

**'Dagirkeriya Tirk bi riya PDK'ê dixwaze Lozanê dubare bike'**

Hêvî Mustefa da zanîn ku xiyaneta PDK'ê û êrîşên dagirkeriya Tirk yên li ser herêmê nîşana pilanên pêkanîna Lozaneke 2'yemîn e û wiha got: "Em dibînin ku dagirkeriya Tirk bi awayekî hovane û bênavber êrîşî bakur û rojhilatê Sûriyê dike. Di heman demê de jî bi deststûra PDK'ê êrîşî Başûrê Kurdistanê û Şengalê dike. Hebûna barghên artêşa Tirk li Başûr jî pilaneke qirêj ya dagirkeriya Tirk e. Ev hemû êrîşên ku li ser van herêman pêk tên yek armanc û yek siyaset e û PDK'ê jî hevkar e. Armanc ji êrîş û pilanên ku dagirkeriya Tirk li ser herêmê bi hevkariya PDK'ê dide pêkanîn, diyar in. Ev dagirkerî dixwaze van herêman dagir bike û siyaseta qirkirinê li dijî gelê kurd pêk bîne. Herwiha kurdan lawaz bike da ku yekrêziyeke kurdî çênebe. Siyaseta ku dewleta Tirk ya faşist ku li ser gelê kurd dimeşîne ne nû ye. Lê belê ji mêj ve dijberiya gelê kurd dike û gelek komkujî di derheqê gelê me de pêk aniye. Heta roja îro jî pilanên qirêj dimeşîne. Ev yek xeteriya wê li ser hebûna kurdan heye û rê li ber dubarekirina Lozaneke din vedike."

**'Êrîşa li ser Nivîsgeha KNK'ê armancgirtina hevrêziya kurdî ye'**

Cîgira hevseroka Kongra Netewî ya Kurdistanê (KNK) Hêvî Mustefa destnîşan kir ku êrîşa ku li ser Nivîsgeha KNK'ê ya Hewlêrê dijî yekrêziya kurdî ye û wiha bi dawî kir: "Erka KNK'ê ew e ku hevrêziya kurdî li ser asta Kurdistanê pêş bixe û pêk



bîne. Lê hin partiyên siyasî yên kurdî hene ku ne di xizmeta gelê kurd de kar dikin û yek ji van partiyan jî PDK'ê ye. PDK'ê di dema îro de hiştiye ku MÎT'a Tirkî biserbestî li Başûrê Kurdistanê tevbigere. Di heman demê de êrîşî Qadên Berxwedanê û tevahiya gelê kurd bike. Me di dema dawî de dît ku çawa MÎT'a Tirk di derheqê nivîsgeha KNK'ê ya Hewlêrê de, êrîş pêk anî, di encama vê êrîşê de jî hevalekî me yê welatparêz gihaşt asta şehadetê. Kar û xebatên nivîsgehê bi awayekî fermî li Hewlêrê tên meşandin û ev êrîşa ku li ser hat kirin jî rûdaneke pilankirî ye. Em êrîşa ku li ser nivîsgeha KNK'ê rû da, şermezar dikin. Ji ber ku êrîşa li ser KNK'ê, armancgirtina tevahiya gelê kurd e. "